



KOVİD-19: Lêzanînên girîng derbarê raberkirina daxwazê jibo Daxwazkerên Penabertiyê

Di vê baska "Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan" de, aniha derfet jibo raberkirina Daxwaza Penabertiyê bi awayê kesane û şexsî tune. Daxwazên Penabertiyê heta danezana din, tenê bi riya Navenda Wergirtina Seretayî ya têkildar dikarin bîn raberkirin.

Raberkirina Daxwaza Penabertiyê:

- Di Navendeke Wergirtina Seretayî ya parêzgehê navê xwe tomar bike. Li wir dê belgeyên têtetîn (derbasbûnê) bo te bîn radestkirin.
- Li Navenda Wergirtina Seretayî jibo radestkirina Daxwaza Penabertiyê, tu dê formekê werbigirî. Wê formê tijî bike.
- Li Navenda Wergirtina Seretayî, dê kopiyayek ji belgeyên hatina te were girtin û hevrê digel daxwaza te dê jibo Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan were şandin.
- Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan dê seba te Destûra Mayîna Demkî derxîne. Bi vê destûrê tu dikarî li Almanyayê bîmînî. Tu tenê dikarî li navçeyekê bîmînî ku Navenda Wergirtina Seretayî ya ku te li wir daxwaz kiriye, li wê navçeyê ye.
- Destûra Mayîna Demkî li navenda ku tu li wir hatiye wergirtin û pejirandin, hevrê digel belavoka rênişander a nivîskî derbarê Pêvajoya Hilkolandina Daxwaza Penabertiyê, dê radestî te were kirin.
- Tu divê ku bi wajo (îmzeya) xwe, wergirtina wê destûrê piştrast bikî.
- Tenê di rewşa ku tu nobeya (dora) seredanê werbigirî, divê Destûra Mayîna xwe ya Demkî di wê rojê de bixwe ji Rêveberiya Federal werbigirî.

Civînen Bihîstin û Guhdarî-kirinê di Pêvajoya Hilkolandina Daxwaza Penabertiyê de, di dema niha de nayên lidarxistin:

Civîna Bihîstina ferdî anku kesane têkildar bi hegerên şexsî yê Koçberbûnê û hilkolandina pirtir a Daxwazên Penabertiyê yê pêwendîdar bi wê, derdem piştî ku ev kar gengaz be, dê werin lidarxistin.

Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan her wiha Daxwazên Penabertiyê yê ku pêştir hatiye raberkirin, dê hilkolîne û berçav bigire. Bersiva Daxwazên Penabertiyê dê ji riya Posteyê ve bîn şandin.

Zanyariyên zêdetir

- Ji kerema xwe li Navenda Wergirtina Seretayî ya xwe bîmîne.
- Neçe nav civîn û kombûnên mezin.
- Bi qasî pêwîst xalên paqijî û lêmiqatebûna tendurustiyê berçav bigire.

<https://handbookgermany.de/en/live/coronavirus.html>
www.bamf.de/inforefugee